DOSYA

TEKNÎK DI ÇÎROKÊ DE

Ebdilxaliq Sultan

Bêguman gelek fakter hene çîrok li ser dihête avakirin, belê hindek fakter hene şêwazekî taybet bo çîroknivîsî pê dihête çêkirin ji wan fakteran, fakterê teknîkê ye. Anku layenê hunerî yê çîrokê, ku bi rêka vî layenî hêz û şiyan û dahînana çîroknivîsî diyar dibe û dikare staylekê taybet û dibe rêbazekê jî bo xwe dirust biket..

Teknîk di çîrokê de li ser çend teweran dihête kirin ji wan: tewrê zimanî ye ku eve girintgirîn û berçavtirîn tewere ku kar li ser dihê kirin lewra gelek ji nivîserên çîrokê bayekê yekcar mezin didin vî layenî û kar li ser dikin ji ber ku ziman rûyê çîrokê ye, evca dê çawa be, li çi ast be, bi kîjan ast dihê darijitin, eve hemû xal in divê nivîser li ber çav werbigre. Ji ber ku gelek caran tenê ziman û şêweyî darîştinê ye ku çîrokê ji vegêraneka siruştî cuda bike li vê derê fere nivîser çarçoveyên berê yên zimanê çîrokê bişkêne û hewil bide ruheka nû bike di peyvan de û şêweyê kilasîkî yê hevokê nehêle belku guherînan tê de bike û mifayê ji zaravên nû werbigre bo bercestekirina teknîka nû ya çîrokê. Zimanê yekser çîrokê dikuje û divê nivîser xwe ji yekseriyê rizgar bike eve jî bi hindek teknîkên nû dihê encamdan wekî bi kar înan (monologan) anku hevpeyvîn li

gel xwe ku eve nevên yekser arîşê diyar bike dê hindek kiriyên li cem qehremanê çîrokê peyda bikî bi rêka van monologên he, wê ew mebesta te bivêt dê derbirînê jê bikî. Her wesa nivîser dikarît teknîka (filaş bek) bi kar bihînit ku berî nûke jî gelek nivîseran ev core teknîke bi kar înabine bi taybetî piştî cengê cîhanî yê duyê ji ber rûdanên vê cengê kartêkirineka mezin li ser kesayetiya mirovan hebû lewra berdewam ev core (Filaş beke) peyda dibûn û nûke ev kare bûye ji teknîkên serekî yên kurteçîrokê û dergehekê başe, çîroknivîs xwe pê ji zimanê rastexwe qurtal diket û tam û xweşiyekê bo xwandevanî pê peyda diket.

Her ji teknîkên dî yên çîrokê ku gelek ji çîroknivîsin kurd jî bi kar înabin ew ku çi pêgiriyê bi zincîreya mantiqî ya rûdanê neket, anku dibît nivîser çîrokê bi dumahiyê dest biket yan jî bi peyva rûdanê dest pê biket û dibît jî her vê zincîrê li ber çav newergirît, ji ber ku rûdan li cem wî ne hinde ya giring e hindî navaroka çîrokê ya giring e. Lewra nûke mirov di gel çîrokan de nexasime ewên li vê dawiyê hatine nivîsîn mina çîrokên Celal Mistefa û Sebîh Mihemed, ev core zincîre ne ya diyare belku tenê ziman kartêkirinê diket û role xwe dibînit û dişêt xwandevanî bi xwe ve bigrît.

Li dawiyê divêt diyar bikim ku evên me gotîn tinê hindek ji teknîkên kurteçîrokê ne, lê divêt em bizanin ku şêwazê nivîsînê jî gelek caran hindek corên teknîkê li ser mirov disepînit û tinê eve bo wî nivîserî diyar dibît ew jî berdewam çîrokê dinivîsit.

ÇÎROK